Helawîstin

Hişyar Rêkanî

Qesta nav bajêrî kir û her gerya kes nedît. Cadên vala. Bêdengî, dergehên daêxistî. Li gelek dergehan da, lê kesê lê nevekir. Li pişt xaniyekî re borî. Dûkêl û agir jê diçûn û niviştû pirtûkên nîvsotî bijaley kolanêne û wî jî ka çi hatiye serî, mîna filmê sînemayê anî ber çavên xwe: Şevê dî çi nema bû şev rojê daîre.. Roj ber bi avabûnê ve diçû.. Esman sor bû.. Tu dibêjî xwîn ya riştiye çavên esmanî.. Şevê silav kire min.. Ronahiyeka kiz ji der ve kete ber çavên min.. Ez jî ber bi wê ronahyê ve çûm.. Ez her çûm û ronahî nêzîk dibû.. Ta ku ez gehiştîm wê ronahiyê.. Çavên min bi mizgevteka kevnare ketin.. Min dengê xwendina quranê bihîst.. Ez çûme mizgevtê.. Tenê pîremêrekê sofî li wêrê bû.. Ridêna wî wekû befirê ya spî bû.. Şelwalek, kirasek û êlekekê pizgirok û patekirî li ber bûn.. Û quranek di destan de bû.. Piştî min silav kiryê û wî jî silava min wergirt û bi xêrhatina min kir, ez rûniştim me pêk ve xwarineka sivik xwar.. Û sofî pirsiyara min kir ka ez kîme û çawa ez li wêrê tişqilîme… Min jî xwe bo pêşkêş kir û min gotê:

"Mam her wekû ev mizgevte tenê li vêrê û çi mal û mirov li vêrê nînin. Ez kesekê nabînim û ez çi dengan nabihîsim. Ez çi ronahiyan nabînim. Wî jî bo min diyar kir ku ew mizgevt ne tenê ye. Wêrê bajêreke û axînkek helkêşa û li pey daxwaza min wesa diyar kir ku hindî Xwedênenas mişe bûne… Mîrê ecneyan hindek ecne hinartîne wî bajêrî her ro du gunehkaran dihelawîsin û ew jî li nav bela wan de dikelin û ter û hişk pêk ve disojin. Û mercên ecneyan jî bê hijmarin, car dibêjin qedexeye ji mal derkevin, tenê ji demjimêr deh bo yazdê têne û kar nahêne kirin ta ku ew qutbiriya gunehkaran neynin û ji bilî mizgevtê deng û ronahî qedexene. Ew jî tenê mela. Û nabe kesek biçe xwendingeh, mizgevt û kargehan. Û dibêjin yê guhê xwe nede wan, sizaya wî qinaredane"

Min jî bo diyar kir ku her kesekê gunehkar dê sizayê xwe li bin

dunyayê wergire, ma ecneyan çi şixul bi mirovane.
Demê min we gotiyê îstîxfar kêşa û gote min:
"Ecne pê agehin. We nebêje!
Wesa diyar bû ew melaye û ez jê pirsîm: "Ka çi rêvîng nedîtine borî bin?"
Wî jî gote min:
"Hêj êvar bû çar genc hatibûn vêrê û digotin ku jêk bijale bûne û nizanim behsê ser karwanê xwe dikir û devê xwe digêra. Û li delîvekê re hindek nobedarên kurê mîrê ecneyan diyar bûn... Min nezanî ka revîn yan girtin."
Çavên min bûne stêrstêrok bi devê sofî ve û min wesa tê anî der ku ew her çar rêvîng seda sed Cengo, Şemo, Xiro û Şêro ne. Betira pêr Cangîrî xwe rakêşa bû wan jî. Ez li nav wan hizran da bûm û hindî ez hatime xwe, xew bi çavên min neket. Xewa min veherimî. Car bo car tezînk bi leşê min de diçûne xwar û cirfekê min xwe dihilavêt. Ne herê ta ku bûye spêde ez nenivîstim û spêdê zû ez rabûm û min xatira xwe ji sofî xwast û ez çûm.
"Oh eve çi hizrin ez dinijnim û diherêfim. Arêşa min ya mezin çarenivîsê hevalên mine. Ez çi bikim? Kû ve biçim? Bo çi da li gel Cangîrî ezmanê xwe dirêj bikim? Dê bila her xewn bi vê cîhanê ve dîtiban. Bila ez şiyabame ezmanê xwe. Ne, ne. Pa heger ew xwe bihijmêre çiya, dêw û mirovan pêşî û mêş! Û min û yê dî û ya dî û wan xwe bêdeng kir, pa kî dê dara wî bişkêne? Nexêr ez bêdadiyê qebûl nakim. Ez naxwazim li gel xwe direwan bikim. Dê xwe bikime çira û xwe bisojim. Da ronahiyê bidim çan û rexên xwe. Ya ji hemûyan baştir min rehên xwe li nav wan da çandîne"
Her bi hizran de diçû û bîrhatin danîne bîra xwe û digot:
"Baş bû ez ji wê daristana mar, dirinde, hirç û dehban rizgar bûm. Bi rastî demê çavên min vêketîn. Ez veciniqîm û mûyên serê min girj bûn.. Dilê min hizar awaz gotin.
Min rêna pişt xwe. Demê ez li paş xwe zivirîm. Dîsan ew dîmenê samnak û bi tirs kete ber çavên min. Lê baş bû xencera min di ber şûtka min re bû ji nû ez piştrast bûm.
Min da rêkê û min xwe neberda erdî. Lê ez gelek caran helingiftim û min gelek renc kêşan, lê ez bêhîvî nebûm. Tu dibêjî ez qaremanê çîrokeka efsaneme.
Ez gehiştim baniyeka berfireh. Hindek helaneber ketine rêka min. Min diviya li ser wan helaneberan razêm û çavên xwe bidanime ser hev. Pîçekê bêhna xwe bidim. Demê min xwe dirêjkirî min destê xwe bire berekî da bidanime bin serê xwe. Kiloxeserek kete ber destê min. Min ho berê xwe dayê. Min çavên xwe zil kirin. Weku dînan ez rast

rabûmeve. Ez mendehoş bûm û min neda û nestand, ji nişkekê ve li navbera helananda min nehaleka kûr dît ya pirî kiloxeser û hestîkên mirovan. Min da hizra xwe ku eve ji qesta ev kiloxesere li vêrê nînin. Eve cihê mirinê ye. Nemanêye. Diyare eve jî weku min hatîne vêrê û xwastîne binivin û eve ya hatiye serî. Nexêr ez nanivim divêt bo xwe li rêkekê bigerim û xwe rizgar bikim."
Ji hizirên ser hatiya xwe veciniqî demê berê wî bi hindek kavle xaniyan ketî û şûnwarên kavlegundî dîtîn û da hizra xwe û bo xwe gote ve:
"Wesa diyare yan kulbek ya li van rabûy, yan zordarek, her wekû sofî li mizgevtê gotiye min, mîrê ecneyan lê peyda bûye û hemû li nav agirê gunehên wan da kelandîne."
Lê nekire çi û her çû. Bi ser rêkekê helbû. Her du rexên rêkê darûbar, zevî û bîstan bûn.
Kaniyek kete rêka wî. Çû hindav kaniyê û daçemiya û hiçkên xwe hildan û hindek tepên avê bi çavên xwe dadan û av li devê xwe werda û gewriya xwe ter kir. Bêhnvedaneka kurt kir. Bêhna wî veresiya û rabû ve û da rêkê û gehişte perê bajêrekî û gote xwe:
"Ya qenc ewe carê ez hevalên xwe bibînim. Paşî kesê destên mêran negirtiye. Babê min gelek caran şîret li min kirîne û digote min: "Dîklê rojekê be û ne mirîşka hemû rojan. Û deng ji destekî nahê."
Demê gehiştiye nav bajêrî li pişt aşî zivirî û çavên wî bi sê kelexan ketin li kolaneka teng û dirêj bi qinaran ve helawîstîne, destê xwe dirêj kire xencera xwe û ji pişt şûtka xwe derêxist û ji kevlanî anî der. Û bi destê xwe girt û ya diteyise û çirîskên ji çavên wî dipeşin û yê dikete qêrî û gazî û gote wan:
"Bo min derkevin ey dizîkeran. Bese xwîna xelkî birêjin û bese xelkî talan bikin. Bese xelkî bişelînin."
Hevalên wî li serê kolanê xwe venûsandîne û çaverêne ka dê çi rûdan çêbibe. Dengê wî bihîstin lê xwe bêdeng kirin, ew bîstek bû xwe ji dava kurê mîrê ecneyan qurtal kirrîn.
Demê ew ji her sê kelexan borî himhimek bihîst û li dor xwe zivirî baş temaşayî waran kir lê kes nedît. Ji dilek kel hêriş bire ser kelexan. Lê kelexan xwe têwer kirin û li erdî gevizand. Û destê wî yê xencer tê de girt û nehêla livên jê bihêt.
Her çar hevalên wî hatine tana wî û ew nobedarên xwe bi rengê kelexan xuya kirî dane ber daran ta ku rateqandîn.
Gotine hev dû: "Eve ne mişextî ye!"
Wî jî xwe di wan wer kir û got:
"Ez bawer nakim eve hûn bin, Cengo, Şemo, Xiro û Şêro.!"
Cengo gote wan:

"Bira hûn her sê bigehine wan nobedaran. Û kurê mîrê ecneyan jî xema min û mişextî"
Dergehekê darî beramber wan kelexan bû. Her duwan milên xwe kirine cot û li dergehî dan. Ta ku ji binkirî û çûne jor û Cengo got:
- Xwe diyar bikin ey xwînrêjên bêbext! Dê çawa li ber destên min rizgar bin. Ez kurê mîrê ecname dê hewe bikime birrmît û helkêşim!!
Mişextî rabezî kurê mîrê ecneyan. Hinek ji Mişextî û yek ji wî. Pişta wî dana erdî û xencer dana ser hefka wî û bo bextbexta kurê mîrê ecneyan û got:
"Bextê we û yê Xwedê. Ez kurê mîrê ecneyan nînim. Ne.. Ne. Ne. Ez mirov im...!!
Dê bixwe te gelekên dî bi van hîle û teşqela xapandîne. Tu mirov nînî... Tu gurgî li nav pîstê mirovan de. Eve me tu kuştî ta ku geha mîrê ecneyan jî dihêt!!"
Cengo jî dergehê zîndanê şkand û ew mirovên tê de hemû berdan û telîsê pare û zêran li pey xwe rakêşa.
Mişextî jî werîsê qinarê bi lingên ewê xwe kiriye kurê mîrê ecneyan ve girê da û li pey xwe raxişand. Ta ku gehandîne ser cadê. Telîsê pare û zêran bi cadê wer kir û pê ve lê geriyan. Û deng bilind bûn û yê nêzîk dibin:
"Mişextî. Mişextî. Dê rabe ji xew eve nîvroye hêj me çi kar nekirîne. Ma tu ji xewê çêbûyî?!"
Cirfek bi Mişextî ket û ji xew rabû. Ew ware lê ne ew bihar. Çavên xwe veperxandin û xewna xwe bo dayika xwe vegêra û dayika wî gotê:
"Xwedê xêr bike day gorî. Here xewna xwe bo melayî bibêje, ew dê bo te şirove bike!!"
- Dadê Siwaroy jî xewneka wesa dîtibû.
Dayika wî jî gotibû:
"Here xewna xwe bo avê bibêje." Lê wî gotibû dayika xwe: "Çendî avên cîhanê bihêne ser yek nikarin rastiyekê veşêrin, heger Siwaro çûba bo avê jî gotiba. Ne av li xewna wî digehişt û ne masî li ezmanê wî digehiştin. Lewra ez jî dibêjim: Mela hemû pirtûkên xwe têkve bidin nikarin tîrojkeka xewna min ron û şirove bikin. Lewra ez dê xewna xwe bikime çîrok û dê bo hemû kesan vegêrim û veguhêzim!"

** Siwaro: Mebest jê çîroknivîs Mihemed Selîm Siwarî ye û çîroka kulî.*
** Cengo, Şemo, Xiro, Hekar: Ji sêzde siwarên Behdînan bûn û bi destên rijêma beis, sala 1985-ê, hatibûn sêdaredan.*
** Cengo, Şemo, Xiro, Hekar: Ji sêzde siwarên Behdînan bûn û bi destên rijêma beis, sala 1985-ê, hatibûn sêdaredan.*